Internationales Zentrum für Menschenrechte der Kurden
Navenda Mafên Mirovatî ya Navnetewî ji bo Kurdan
International Center for Human Rights of the Kurds
Centre International pour les Droits de L'homme des Kurdes

Ji bo raya giştî

Li ser bombeteqandina li Dîyarbekir û bi awayeke nû yê terora Dewleta Tirk

Li Dîyarbekirê herema Baxlar, di êvara roja Çarşemê nêzikî parkekî da bombeyek hat teqandin. Di encama vê teqînê da 10 kes hatin kuştin û 15 kes jî birîndar bûn. Di nava qurbanîyan da 7 kes zarok in.

Tiştê herî balkêş ew e, ku teqandina van bombeyan, rojek paşê li ser civîna Partîya Civaka Demokratîk (DTP) a ku ji bo medya çêkirîbû, pêk hat. Di vê civînê da serokê DTP û her weha serokê Şaredarîya Dîyarbekir amade bûbûn û her weha banga PKK hatibû kirin, ku bi yekalî şer bide sekinandin.

Rêxistineke bi navê Tugaya Tolhildanê ya Tirk (TİT) li vê êrîşa hovane xwedî derket. Ev rêxistin di malpera xwe ya bi navê www.turkîntîkamtugayî.8m.com daye aşkere kir, ku ji ber sedema kuştina leşkereke Tirk, bi navê Alî Balikçi, vê teqandinê kirine.

Di daxuyanîya TİT-ê da hatiye eşkerekirinê, ku ji ber kuştina her leşkereke Tirk, dê li Dîyarbekir 10 Kurd bên kuştinê. Di vê rûpela înternetê da, di gel daxuyanîyê, wêneyên bi cure cure yên bombeyan ku li Dîyarbekirê bi têlefona destan hatibû teqandin, jî cîh digrin. Di daxuyanîyê da tê eşkerekirinê, ku **"Kurdê herî baş, Kurdê mirî ye!".**

Li gor bîrûbawerîyên me, li paş rêxtina bi navê "TİT"-ê, hêza paramîlîter ya leşkera Tirk û "hêzên taybetî yên şer" hene. Evana bi salan in hember gelê Kurd û sîyasetmedarên Kurd êrîşan pêk anînî, terora devletê bikaranîn.

Serleşkerekî Tirk a ku teqawît bûye, çendek berê li ber medya Tirk eşkere kir, ku dema ew li ser kar bûye, di hin cîyan da bombe daye teqandin, her weha bi xwe jî beşdarê van karên bî qîret bûye.

Çend meh berê, li bajarê Şemzînan, 3 zabitên Tirk xwestin dikaneke pirtûkan bombe bikin, lê ser neketin. Ev kesana hatin girtin û xelqê bajêr ew teslîmê hêzên parêzker kirin.

Hêzên dij-Yekitîya Ewrupa, dij-demoqrasîyê, hêzên nijadpereset ku naxwazin pirsa Kurd li Tirkîyê bi awayekî aşitîxwaz û demoqratîk bê çareserkirinê û her weha dewleta kûr, hewil didin ku dijmînatîyan derxin, nifaqî bixin navbeyna gelên Kurd û Tirk.

IMK e.V.
Postfach 20 07 38
D – 53 137 Bonn
Telefon +49 (0) 228 36 28 02
Telefax +49 (0) 228 36 32 97
E-mail: imkkurds@aol.com
www.kurden.de

Gegründet: 1991

❋ **Mitglieder des Vorstandes:**
Dr. Hüseyin Bektas
(*Vorsitzender*),
Irina Wiessner
(*Stellvertr. Vorsitzende*),
Dr. Golmorad Moradi
(*Kassenwart*)

❋ **Mitglieder des Beirats:**
Heidi Merk
(*Sozialministerin des Landes Niedersachsen a. D.*)
Dr. h.c. Herbert Schmalstieg
(*Oberbürgermeister der Stadt Hannover*),
Uta Zapf (*MdB*),
Dr. med. Omar Simo,
Amke Dietert – Scheuer,
Cem Özdemir,
Knut Rauchfuss

❋ **Geschäftsführer:**
Abubekir Saydam

IMK e.V. ist vom Finanzamt Bonn als gemeinnützig anerkannt und von der Körperschaftssteuer befreit – Nr. 206/5866/0334

Gefördert durch den Europäischen Flüchtlingsfonds

Bankverbindung:
Bank für Sozialwirtschaft
BLZ: 370 205 00
Geschäftskonto-Nr.: 83457 00
Spendenkonto-Nr.: 83457 01

Das Zentrum ist eine international und regierungsunabhängig arbeitende Organisation. Die Tätigkeit des Zentrums erstreckt sich auf alle Gebiete, in denen Kurden leben und befasst sich ebenfalls mit den Belangen anderer in dem Siedlungsgebiet der Kurden lebender Volksgruppen, wie der Assyrer, Armenier und Turkmenen, der religiösen Minderheiten, etwa der Yeziden und der syrisch-orthodoxen Christen, sowie der Kurden in der Migration und im Exil.

Bi wî awayê ew hêvî dikin, ku dewleta Tirk hember gelê Kurd şerê qirêj bidomîne û her wekî berê hebûna Kurdan bê înkarkirinê.

Em bi awayekî tund van êrîşan rûreş dikin û ji hukma Tirk daxwaz dikin, ku terora dewletê ya hember gelê Kurd bide sekinandinê.

Divê êdî xwîn neyê rijandin!.

Ji Yekitîya Ewrupa û ji dewletên endamê wî daxwaz dikin, ku tesîrê li ser Tirkîyê bikin, da ku JİTEM, Sîstema Korîcîtî û hêzên paramîlîter bên belavkirinê; her usa sucdar bên dadgehkirinê.

Welatek ku terora dewletê tê ajotin, ji bo lînçkirina însanan îcaze tê dayîn, cîhê wî welatê li Yekitîya Ewrupa nîne.

15.08.2006

Abubekir Saydam
(Rêvabir)